Adara me

Bavê Sîbarî

Hozanvanê Kurd (Hebîb Keleş) di pirtûka xwe a helbestan (*Zanîn û xebat*) de dibêje:

Adara xelkî bi gul tê
A me bi şînî û bi kul tê

Çêdibe zarokên hêja bipirsin: Çima?

Em bi xweşhalî ve dibînin ku zarokên me ên niha Adarê bi xweşî û şadî dibuhurînin, ahengên xweşik li dar dixin û diçin seyranan, lê divê em ji bîr nekin ku bi saya serê hizaran canfîdayan ev xweşiye ji me re misoger bûye. Em dikarin li vir navê hinek ji wan binin:

• Serokê netewa kurd (Mela Mistefa Barzanî) li 1-3-1979 piştî jiyekê pir serwerî koçbar bû.

• Li 6-3-1975 hukmeta Îraqê bi palpiştiya (Îran, Cezayir û Emrîka) rêkeftinek mor kir û hizaran malên kurdan bo mawê pitir ji bîst salan derbiderî welatê Îranê kirin.

• Li 16-3-1988 rijêma Sedamê gorbigor bi serkêşiya serşorê zîndanan (Elî Kîmyawî) bajêrê *Helebce* kîmyabaran kir û di encam de pênc hizar kes şehîd bûn.

• Li 28-3-1991 ji ber zulma Sedamê xûnxwar, bi milyonan kurd mişextî welatên Îran û Turkiya bûn.

• Li 31-3-1947 pêşewayê kurd û damezrênerê *Komara Kurdistan* (Qazî Mihemed) li bajêrê *Mihabad* hate sêdaredan.

Niha zarokên hêja ez bi bawerim we zanî çima (Adara me kurdan bi şînî û bi kul tê